

Ya giring bi kurtahî

Hun wekî penaber mafê we ji bo bidestxistina xizmetgûzariya tendurustiya bingehîn heye.

Çi?

Pişkinîna tendurustî ya mecbûrî li gorî mada § 62 ji qanûna penaberiyê (AsylG):

- Pişkinîna gewde ji ber nexweşeyeke vegirtinê
- Kîşandina wêneyê tîjkane ji fişikê re ji bo dûrkirina êşa kulbûna fişikê
- Pişkinîna xwînê (Kulbûna kezêbê B, HIV)

Xizmetgûzariya tendurustî:

- Dema ku nexweşinên dijwar û êş hebin, di nav wan jî de derman û girêdana birînan
- Pişkinîna pêşlêgir yê tendurustî û pêdivî û vaksînêdan
- Ducanî û jidayîkbûn
- Tedbîrên, ku ji bo mukumkirina tendurustiyê pêdivî bin
- Guhdaneke giştî ji bo zarok û gencên bêxwedî û negihayî
- Guhdaneke taybet di rewşên tecawiziyê cinsî de, îşkence û serpêhatiyên tund û tûjiyê

Çawa û li kû?

Hun dikarin li ba birêvebiryê herêmî ji bo karûbarên penaberan (LAF) daxwaziya derxistina karteke tendurustî ya elektronî bikin; hêdî hun dikarin wê kartê berî cîbecîkirina pişkinîna pêşberî textor bikin. Heger di dema serdana textor de hîn ew karta we ne li ber dest be, wî çaxî belgeya we ya qeydkirinê jî wê têrê bike, ku hun werin dermankirin.

Birêvebiryê herêmî ji bo karûbarên penaberan (LAF) dikare ji bo hindê kesên tekane destûrê bide ji bo dermankirineke pêdivî ya zêdetir.

Ev belavok bi zimanê darî, elmanî, erebî, farisî, ferensîzî, inglîzî, kurdî-kurmancî, paştî, rûsî û bi tirkî li ber dest e.

Daxistina bê beramber li ser:

www.mimi-bestellportal.de

www.wegweiser-gesundheitswesen-deutschland.de

www.berlin.de/laf/leistungen/gesundheits

Weşanger:

Landesamt für
Flüchtlingsangelegenheiten
Referat Medizinische Versorgung
Darwinstraße 14 – 18
10589 Berlin

Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.
Projektzentrale Berlin
MiMi-Integrationslabor Berlin
Großbeerenstraße 88
10963 Berlin-Kreuzberg
berlin@mimi.eu

Desteya nivîskaran:

Desteya nivîskaran: Heike Weise, Monika Hebbinghaus (LAF Berlin),
Ramazan Salman (MiMi-Lab Berlin), Anne Rosenberg,
Elena Kromm-Kostjuk (Projektzentrale EMZ Berlin).
Çavkanîya wêneyê: EMZ e.V., Fotolia.com
Çapa: Gulana 2019an · © EMZ e.V. – hemî maf parastî ne



MiMi

**Das Gesundheitsprojekt
Mit Migranten
für Migranten**



Kurdisch

Xizmetgûzariya tendurustî ji bo penaberan li Berlînê

Gehîştin, tendurust be, tendurust bimîne.

Landesamt
für Flüchtlingsangelegenheiten



Bi xêr hatin li Berlînê!

Bi vê belavokê em dixwazin wan mirovên, ku li Berlînê daxwaziya mafê penaberiyê dikin, derbarê çend mijarên bingehîn yê xizmetgûzariya tendurustî agahdar bikin.

Piştî geştiya we ji bo Elmaniya giring e, ku hun hayî ji tendurustiya xwe hebin. Wek daxwazkerê penaberiyê mafê we ji bo bidestxistina xizmetgûzariyê bingehîn ya tendurustî heye. Ev kar di rêka dezgehên fermî yê welat re (daîra tendurustiyê, birêvebiryê herêmî ji bo karûbarên penaberan (LAF) tê misogerkirin.

Me agahdariyên giring ji bo we berhevkirine:

Çi mafên we di çarçoveya xizmetgûzariya tendurustî de hene?

Li gorana yasaya alîkariyên penaberan (Asylbewerberleistungsgesetz) ya elmanî we di her 15 heyvên pêşî de ji niştêcîbûna xwe li Almaniya mafê wergirtina xizmetgûzariyê bingehîn ya pêdivî ji bo tendurustiya giştî û tendurustiya dinanan heye.

Tiştê bi xwe hildigire dermankirina nexweşî û êşên lezgin e, derman û şaşên birînan û hinek pişkinînan pêşlêgir yê ji aliyê tendurustî ve pêdivî û vaksînên asayî ne. Xizmetgûzariya tendurustî û guhpêdana di dema ducaniyê de û herweha li dema jidayikbûnê û di pey wê re jî dikevin bin wê yasayê.

Eger hun li gorî yasaya niştêcîbûnê (Aufenthaltsgesetz) xwedî pêdiviyên taybet yê qebûlkirî bin, wek nimûne wek kesên temen biçûk yan mirovên îşkence, tecawiziyê cinsî yan jî formên din yê giran yê zordestiya derûnî, fîzîkî yan tund û tujîya cinsî dîtîbin, hun dikarin hingî xizmeteke nojdarî ya mezin werbigirin.

Çi erkên min hene beramber tendurustiya min û tendurustiya kesên din?

Eger hun li kampeke penaberan yan jî li maleke jiyana hevbeş hatîbin bicihkirin, hun mecbûr in pişkinîneke tendurustî li gorî mada § 62 ji qanûna penaberiyê (AsylG) di rêka birêvebiryê herêmî ji bo karûbarên penaberan (LAF) re encam bidin.

Ew van bi xwe ve digire:

- Pişkinîna laşî derbarê nexweşiyên vegirtinê
- Kîşandina wêneyê tîjkane ji fişikê re ji bo dûrkirina êşa kulbûna fişikê yan jî pişkinîna xwînê (Ji bo jinên ducaî û zarokên temenê wan di navbera 10 heta 14 salan)
- Pişkinîna xwînê (Kulbûna kezebê B, Nexweşîna AÎDS (HIV))

Beşdariya we di van pişkinînan de giring e. Beşdariya we rê li ber belavbûna nexweşiyên vegirtinê digire û bi wê rê we û kesên din jî wan nexweşînan diparêze.

Çawa ez dikarim xizmetgûzariya tendurustî werbigirim?

Di çarçoveya qeydkirina we de wek penaber, birêvebiryê herêmî ji bo karûbarên penaberan (LAF) daxwaziya derxistina karteke tendurustî ya elektronî ji bo we dike. Ev kart piştî nêzîkî 6 heftiyên ji we re tê şandin. Eger hun nexweş bin yan heger hun biêşihî, herin ba textor û wê karta xwe pêşberî wî bikin.

Heger we hîn kart nebe, hun dikarin ji şûna wê ve wê belgeya çapkirî derbarê daxwaziya karta tendurustî pêşberî textor bikin. Bila ew belgeya qeydkirinê li ba we be, heta ku kart bighîje ber destê we.

Hun dikarin agahiyên derbarê iyadeyên textoran yê nêzîkî we ji kampe hun lê dimînin yan jî ji mala jiyana giştî, ku tê de dijîn, werbigirin.

